

SAL 2
HEJMAR 18
—
ÇARŞEMB
1 İLON 1943

RONAHİ

ANNÉE 2
NUMERO 18
—
MERCREDI
1 SEPTEMBRE 1943

SUPPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR

JI BİRƏN SEFERA SICİLYAYË



Ingiltîz û emêrikanîyan sefera Sicilyayê di nav 43 rojan de temam kirin û girav vegirtün. Klîşa me eskerine emêrikanî şanî dide; yêñ ko dikevin gundeki giravê.

ÇAPXANA TEREQIYÊ
ŞAM — 1943

DI VÊ HEJMARÊ DE

Sêro û Pivaz	Çirokbêj
Çawan Çente dizin	Lawût
Biserhatî	Cemîlê Tacdo
Hevalê Çak	Osman Sebri
Rahbe	Bişarê Segman
Reqê Avê	Dilawer Çarpîne
Nêçir	Osman Sebri
Pira Torê	Cegerxwin
Hey Kurd	Cegerxwin
Xiyal	M. E. Botî
Sêr û Mişk û Rovi	Brahîmî Isa
Napolyon	Osman Sebri
Hindik Rîndik	Xeberguhêz
Qertel û Kûsi	Mihyedîn Pehlewî
Hinek ji Hinek	Yarîker
Berazeki Londrê	Ronâhî
Kurdmancino	Xebatdarê Welat
Xarkov	Nêrevan
Elemanye û Rohelet	V. Hûrban

ÇIROKA KURDMANCI:

SÊRO Û PÎVAZ

Dibêjin ko carekê du zilam brayê hev bûn. Navê yekî Sêro û yê ë di Pivaz bû.

Rojekê Pivaz gote Sêro:

— Bira, min divêt ez biçim xulamiyê; tu çi dibêji?

Sêro got: Tu bi dilê xwe yi, lê tu ji ya min bikî naçî, tu 'nikarî xulamiyê, bikî, tebiêtê te ne xwes e

Pivaz got: nabit ezê biçim

Sêro got: bila be, tu bi dilê xwe yi Sibehî Pivaz rabû çû, bû mîhvânê keşeki. Keşe got-ê: Pivaz tu li çi digerihî

Pivaz got: Ez ji bo xwe li xulamikê digerihim

Keşe got: were bibe xulamî min

Pivaz got: qenc e, sala min bi çi ye?

Keşe got: qewlê min û te ne bi sala ye, belki qewlê min û te heta pepûk bixwînî, ezê hevqas bidim te. Bi wî şertê ko heçi ji min û te bienirit emê zolekî çerm ji pişa stoyê wî rakin, heta ser dûyka wi.

Pivaz got: qenc e.

Sibehî rabûn ji xew, keşe got Pivaz: Here cot, seyê min li kû rûnişt li wê derê cot bike, évarê barek darên hétowil digel xwe bine. Ezê taştiya te rékim

Dema Pivaz çû çolê, seyê keşe çû

geriha li ser berektî mexel hat. Pivaz gayê xwe girêda, li ser tehtê cot kir. Dema taştê, keşe taştê da keça xwe û got-ê:

— Bêje Pivaz bila nan neşkénit, tokê mast ji neşkénit, sehit nekê têr bixwit. Évarê dema hat mal bila ga li derî de neêxit mal de, diwar ji xirab nekê

Keça keşê çû nik Pivaz, herweki bayê wê got-ê; ewê ji welê got Pivaz.

Pivaz eniri nan ne xwar, ma heta évarê. Évarê hat, got keşe:

— Mala te neava, ezê biçim mala xwe Keşe got-ê: ma tu eniri

Sêro got: erê ez enirîm

Keşe got Pivaz: Me qewlê xwe kiriye, ezê zolekî çerm ji pişa te vekim

Keşe rabû zolekî çerm ji pişa Pivaz vekir.

Pivaz tevli wê xwinê çû nik Sêro.

Sêro got: bira te li ser min lazim kir ez biçim heyfa te

Sibehî Sêro rabû berê xwe da mala keşe, bû mehvânê wi.

Sêro bû xulamî keşe. Keşe tiştên goti Pivaz welê gote Sêro ji. Sêro ji qebû kirin. Sibehî Sêro rabû çû cot. Se ji bi xwe re bir. Se disa çû li ser tehtekê mexel hat. Sêro dest avêt berektî li bin guhê seyê keşe da, kuşt; çû li erdeki xwes cot kir. Dema taştê, keşa keşê taştiya Sêro anî wek got-i Pivaz, wele got Sêro ji.

Sêro got, qenc e. Sêro rabû ji navan nan xwar dora wi ne şkand, binê dizikê qul kir tokê wi ne şkand. Dema têr xwar, binê keçkê ji qul kir. Keçik vege riha hat, got babê xwe.

Dema bû évar Sêro rabû nîr û halet şkandin, li kerê kirin, anîn mal.


Dema Sêro hat pişa xanî her du ga ji şerjêkirin, qet qet kirin li kulekê re avêtin, û hat nik keşe.

Keşe got Xwedê qeweta te bidit, kanî seyê min

Sêro got: Min seyê te kuşt, min keşa te ji xirab kir, min nîr û hatet ji şkênanîn, min gayen te ji şerjê kirin, qet qet kirin li kulekê re avêtin, ma tu enirî?

JI WEXTÊ XWEŞİYÊ

Polonye wek piraniya dewletên Ewropayê, iro di bin lingên eskerên neyar de dinale. Ev welat ûris û elemanan bi hev re vegirti bû. Hingê ûris û eleman hevalbendên hev bûn; piştre bûn neyaren hev. Polonye fro büye xerabezarek. Ev her du klişe şenahiya wi welafti di wextê aşiyê de, şanf didin. Keçikin direqisin, hinê din di rézika rêcezanen de dimeşin.



Keşe got: ne xêr ez ne enerime.

Keşe û jina xwe li hev şewirin, gotin; emê iro kadê ji xwe re çeki, esidekê çeki, emê birevin, Sêro bihili xew da.

Pêkanîna xwe kirin, kada xwe, esida xwe kirin ciwalkî û danin wê derê.

Dema keşe û jina xwe nivistin Sêro rabû tiştên he ji ciwal derêxistin û xwe kir ciwêl de. Beri sibehê keşe rabû ciwal hilgirt, jina wi kete pêş, çûn. Niziki sibehê mîza Sêro hat, di ciwêl de mist.

Keşe got jina xwe: keçê esida te çiqas têr-dihin e.

Jinkê got: Wê bima ji Sêro re, min hemi exist esidê.

Dema çûn niziki gundekî seh hatin wa, keşe got jina xwe.

— Xwezi Sêro li hir bûya, da seh ji me vekirana.

Sêro got: Mamê keşe min dane ezê se ji we vekim. Keşe Sêro dani.

Disa 'keşe û jina xwe li hev şewirin go emê biçi şev li ser pirê razî. Jinkê got keşe: tu li nav de raze, ezê li rexê tê 'ê rastê razim, bila Sêro li rexê çepê



razê. Dema bibit nivê şevê emê rabî Sêro bavêjin avê, jê rahet bibin.

Dema bû nivê şevê Sêro çû cihê keşê, keşe anî cihê xwe, demekê ma û ba kir jinkê

— Rabe em Sêro bavêjin avê

Jinik rabû deştên keşê girtin, Sêro lingên wi girtin, avêtin avê. Keşe li avê de çû, Sêro jina keşe ji ji bo xwê anî. Heyfa birayê xwe ji ji erde rakir.

Çirok çû deştê dê û babê me çû bihuştê.


ÇAWAN

ÇENTÊ WEZIRÊ ELEMANÎ DIZİN


Her weki xwandevan dizanin, Fenlenda hevalbenda Elemanan e; lê di navbera wé ú Emérika da şer nîne. Ji lewre ev her du milet bi nav hev da diçin ú tê.

Di sala 942an dabijşkeki emérikanî gîha bû Helsinkiyê, paytexta Fenlendayê. Pir ne ajoti bû ko jin ú keça wî a çeleng ji di pa ra xwe gîhandi bûnê. Di nava çend mehan da, bi jîhâf bûnê navekî ecêb bi pê bijîşk Rêntri ket ú li ber derê wî nexweşan rê ne didane hev.

Jina bijîşk a zana tevî keça xwe a çeleng ji di riya qencî ú comerdiyê da navekî mezîn ji xwe ra birin. Van her du jinan (dê ú keç) rojê pê da xestxane û şargehên belengazan ziaret dikirin ú bi destekî comerd ú xêr xwaz arfakariye



TOFEK JI XELKÊ HAMAYE DI BIN BANDERA EMERIKANI DA



KUMIRÊN TOZ DIKIN HEVİR Ú WAN DIXIN ŞIKILÊ KERPIÇAN U DISEWITINÎN

wan dikirin. Navê xêr xwaziya wan ewçend belav bû ko di bangeh ú cihen tevayî da bê pesna wan tu gotin tine bû.

Gêstapo, dafra polisa elemanî edi nema dikari bûn guhêw xwe ji bihîstina pesnên derhêq emerikaniyan da vekîf bihêlin. Sereklî paşgotiniya bijî kînentrî kirin. Gava ditin ev yeka han fêde neke, rabûn li Elmanayê bijîşkeki wele anîn; iê Rêntri serdestiya xwe parast, ji ber ko bi nexweşan ra i comerd bû.

Di pêşîya sala 943 an da ko bi ci ramane bû, wezîrî elemanî hat xaniyek di rex ê bijîşk Rêntri da girt. Pişti ve bi çend rojan, sê ne xweşen emerikani hatin nik bijîşk Rêntri giliyê ne-xweşîyeke kevin dikirin. Bijîşk ji, ji wan her sê mirovan ra sê ode raxistin ú dest bi derman kirina wan kir.

Pişti ve bi hestekê rojnameyên Fenlendînivisîn ko: ji bo danzanfna hin tiştan wezîrî elmanî dê bi balafirekê biçe Berlinê.

I ê wezîrî elemanî ne çû Berlinê ji ber ko bûyerek lê qewimî; çentê ko rapor ú ewraq tê da bûn hati bû dizin. Xaniyê bijîşk Rêntir di dîwîr da hati bû vekîrin ú derbasf xaniyê wezîr bû bûn, bi tenê ew çente biri bûn.

Dema Gêstapo dora xaniyê bijîşk girt ú velo kir, ne nexweş, ne ji bijîşk ú keç ú jina wi ne hatin ditin.

Gava emerikaniyan ev nûçeyen han belav kirin; hîngâ xelkê zanf ko di çehntê wezîrî elemanî da ci hebûn ye. Newyork-Teymîs digot: « Ji fro pê ve nema Eleman zad didin Fenlenda. Ji bo dîlxwesiya Fenleudyian Eleman dixwazin nişanekê bidin marêşal Manêr-haym ».

Ev bû xebata ko bijîşk Rêntri ji bo welat ú welatiyêñ xwe kir.

Ji xwe şerê mezîn di navbera mirovén jîr da dibe; lê ne di qada şer da...



Piştî ko her du général De Gol û Jiro gihane hev û yekitiya erdên kişwerê Fransayê anîn pê; Franse ji nû ve, rexma ko welatê mader vegerti ye, dest bi xurtbûnê kiriye Heçl fransiz û heçi xelkê welatên ko di bin bandera fransizi de dijin, tof bi tof diçin talimgahan û hîni eskeriyê dibin. Fransiz fro ordûke ji 300000 peyayı bihevketî saz dikin; da ko di êrişa mezîn de bi hevalbendên xwe re dakeyîn beja Ewropayê û welatê xwe bi desten xwe xelas bikin.

BISERHATIYA

NOQAVEKE BRITANI

Kumandarê noqava britanî « Taiko » Kaptan Pit ji rojnamevanekî ingilizi re, biserhatike noqava xwe qise kuriye û gotiye:

Em di behira Êgê de bûn. Ji Efsnê, payîtexê Yewnanistanê, bi çend mîlan dûr. Ez bi xwe li ber dûrebînê bûm. Ci rojeke ges û xwes. Di xwerübûna heşfnahiya xwe de, behir û ezman dikirin ji hev derkevin. Li ezmén ne ewrek, li behirê ne pêlek....

Perav bê dû û dûman, lat û zinaran, ji me ve, yeko yeko û zelal xuya dikir. Zemanên borî, rojîn ko em bi filûqan derdiketin seyananê, dihatin bîra min.

Ez di van texmînan de bûm ko di ber dûrebînê re perçak dûman derbas bû. Di pey re min dengê motorê kir; balafirek... Hêrhal di van doran de faporqesfleyek hebû.

Gelek ne borî vaporeke barkêş xuya kir. Du balafir û vaporeke çekirî ew dihemandin. Vapor ber bi me ve dihat; di navbera me de pênc mil ma bûn. Min emirê xwe da ko noqavê daxin binê avê. Noqav binav dibû û herkes

çû ser karê xwe. Vapor di nîzingî me re derbas bû. Keştiya mihafiz li paş bû. Deryavan di ser pira keştiyê re feriqet diçûn û dihatin. Ne dihate bîra wan ko dijminê wan xwe kar kiriye û dike li wan xîne. Me torpidêن xwe berdan. Yek li orta vaporê keti bû. Didevanê me bi şahî û bi dengkefî bilind got: « Torpidêne mi riya xwe şas nakin ».

Piştî ko me torpidêن xwe berdan û hingafte vaporê em ji wê derê bi dûr ketin. Vapora mihafiz ewê bera me bidaya. Me çend teqîn ji bihîstî bûn. Min ji mihendis pîrsî heke me hingafte makîneyên vaporê. Mihendis digot tu dengê makînan nayin; divêt makfiye sekîn bin.

Qederê bîstî deqlîqan ketin navê. Di vê çendê de me tu deng seh ne kir. Ma vapora mihafiz ci dikir. Gelo xwe kar dikir û deryavanen vapora ko me léxistî bû, ji rûyê avê didan hev.

Em di van texmînan de bûn ko mihendis em li dengê perwanê hisyar kirin. Di ser me re vaporekê xwe tev dida. Piştî çend deqlîqan bombeyine binavîn di dora me de diteqîyan. Perçeyine bomban ji dihingaftin qalikê noqavê. Vaporê yanzdeh bombe berda bûn dora me.

Di nav wan de bombeyine bi sê tonan giran ji hebûn.

Dijmin etlahî da û makîneyên xwe vemirandin. Bi vî awayî dixwest cihê me bi temamî seh bike û bombeyen xwe bîhingivîne me. Etlahiyê midelf dom kir. Vaporê makîneyên xwe ji nû ve şixulandin û dest bi avêtina bomban kir. Çend bombeyen din ji avêtine me. Bi teqîna her bombayê noqava me dihejîha û bi ser xwe de diçû û dihat. Di vê navê de didevanê me ji min pîrsî heke vapora ko me bin av kir du dîrek û 'bixêriyek an bixêrsyek û dîrek hebûn.

Ma wextê vê pîrsiyariyê bû. Min bi erin lê vegerand û got: Du dîrek û bixêrsyek wê hebûn.

Dengê perwana vapora mihafiz nema dihate bîhîstîn. Em derketin rûyê avê. Vapor ji me bi dûr keti bû. Lê xuya dikir ko hêj li me digeriya.



EMELEYINE İNGİLİZİ YEN KOMIRA KEVİRİN

HEVALÊ ÇAK

Di serê meha Tebaxê û şeva yekşembê da hevalê çak, xortê gelparêz Ehmedê Baravî piştî nexweşîya du salan cû rehma Xwedê..


Ehmed, ji xortên kurdên Şamê ên gelparêz yek bû. Di sala 938an da, gava ez ji sırgûnê vegeferm û li Şamê rûniştüm; min Ehmed tevi şes xortan naşî bû. Gava bi navê welat û welatfniyê min deng li xortên taxê kir, Ehmed ji dî nav her şes xorten mayî da guhê xwe da min û bi dilekî paqîj û xurt berê xwe da riya xebata welêt. Piştî ko yekitiya xortan hate pê, di warê welatfniyê da xebata Ehmed ji a hevalen wî ne këmtir bû. Lé di warêna rastî û dilçakiyê da rehmetî xwe da bû qorê pêgin.

Di dinê da, wî armanc û hêviyeke bi tenê hebû ko ew jî; rojekê welatê xwe aza û gelê xwe serdest bibne. Di vê rê da herçiya ji Ehmed bîhatâ xwestin bi camîf dikir; çawan herçiya jê hati bû xwestin ji kiri bû. Lé selekê ro bi serê Ehmed ne xist û di sala 941an da sîngjara malkanbak destê xwe û xwînrêj direjî kezeba Ehmed kir.

Li ber vê bobelata han em destgirêdayî ne man û herçiya kirin diviya bû me kir; ew destê merxur di hinavê hevalê xwe da bi derxist. Me ji xwe ra dizanî ko edî Ehmed ji nexweşîya han filiti û wê di nav me da bimfîne û rojekê ji rojan bigehe armanc û daxwaza xwe. Lé gava daxwaza Xwedê bi tistikî tine be, nabe û herçiya ko wî xwastiye jî dê bibe. Bendewariya hevalan û nérînabijşkan Ehmed

Me sê rojén xwe di wan doran de derbas kirin. Roja sisayan vapora me digel çend vaporeñ din en çekirî bi ser me de vegeeriya. Em noqî avê bûn. Heye ko dijmin em bûn. Ji ber ko rojê pê de bi bombezine binavîn noqava me hejandin. Me şev ji di binê behirê de derbas kir da ko em dijminê xwe bikarin bixapfîn.

Dotira rojê ji kêmâniya hewayê edî em aciz dibûn. Tukesî ne xeber dida, ne ji xwe tev dida. Ji ber ko bi tevdan û xeberdanê me hewa hêj bêtir kêm dikir. Di ser me re dengê perwaneyê vaporan nema dihate bihistan. Me



EHMEDÊ BARAVÎ

ji pencen mirinêkuta ne kir. Herweki sîngjare rika Ehmed kiri be dile xwe ko vê carê destê xwe û malkambax dirêjî hestiyê wî kir.

Dema bijşkan xwestin destê wî û nexwes bibirin, Ehmed qail ne bû û got: « mirovekf bê dest bi kérî xebata welêt naye. Gava eze ji xebata welatê xwe bê par bimfînim, mirin ji min ra baştir e ». Bê birina dést ji xwes bûn ne mikûn bû. Dawi, di serê Tebaxê da canê xwe siparte Xudayê comerd.

Ehmed di şeva mirina xwe da sê wesiyet kiri bûn. A péşin xwesti bû ko ez serê wî girêdim û cendekê wî daxim gorê. A dudûyan ko ala kurdî deynin ser cendekê wî. A sisîyan ko ez li ser kêla gora wî bi zimanê kurdî sê hevde xwesxwan binivîsim. Her du daxwazên pêşin di roja mirinê da me bi cih anîn. A paşin ji ev e li ser rûpelê Ronahiyê dinivîsim. Ko Xwedê hez bike, dê li ser kêla gora hevalê rast û héja Ehmedê Baravî binivîsim. Heke Xwedê Ehmed ne gîhande daxwaza wî; dikare hevalen wî bigehînê.

Nîvisana ser kêla gorê ev e:

- « Me armanc azahî bû her »
- « Di wê rê dani can û ser »
- « Beri bigehêne daxwazê »
- « Felekê gote min: razê »
- « Bê dem ez çûme goristan »
- « Bijin her Kurd û Kurdistan »

Kortê gelparêz Ehmed, kurê Mistefayê Baravî li vir radîz; rehma Xwedê lê be.

OSMAN SEBRÎ

dürebîna xwe xiste rûyê behirê û li dora xwe temaşa kir. Tu şopa dijimin xuya ne dikir. Me da rû û hewa pak teneftis kir. Em ji nû ve vegeeriya bûn jiyîne.

Sê rojén din en nû ketine navê. Em rastî vaporeke barkêş e piçûk hatin. Ne héjayî torpîdê bû. Lé hevalan gelek li ber min da. Me jê re torpîdeli şand û hingasta orta vapore. Binavûna wê gelek ne ajot. Di vê navê de şes balafrîn dijmin ji bejê berê xwe da bûn behirê.

Dinya tarî dibû; me berê xwe da bendeke bêterf.

CEMİLÊ TACDO

R A H B E

Navê wê Honorya bû. Di bajarê Ravnayê û di sala 417an de ji diya xwe bû bû. Valantinos birayê wê è mezin bû. Bavê wan imператор Konstansê III û diya wan imператорice Plasidya bû.

Hêj di ciwaniya xwe de bi evînê ket û zabitek ji serbendên qesira bavé xwe heband; hebandineke kûr û dîjwar. Lê diya wê a nefis-mezin li xwe danetanî ko keça wê zabiteki ji zabiten qesirê bike.

Ma Plasidya çawan qîma xwe bianiya ko Honorya bibe jina zabiteki adeti. Di bin hikimê Romayê de kişiwerine bêhejmar hebûn. Her kişiwerî mellek û mirekin hebûn. Diviya bû ko Honorya biba jina mireki wan kişiweran. Heke stérka wê geş hilata ew mîr rojekê dibû melik û Honorya dibû melleke.

Lê Honorya hez dikir; hezkirin zehmet, evîn xurt e. Di ber çavêن keçikê de evîn di ser her tişti re bû. Dilê wê qail ne dibû ko ji bo rajeriya tacekê li evina xwe ase bibe.

Dê û brayê wê çi dixwestin. Ji xwe re ji nav mellek û xudantacan li mirektî bigere, ne?.... Belê.... bila be.

* * *

Honorye qerara xwe da û ji xwe re mirektî



DI SALONA XESTEXANEKE İNGİLİZİ DE DÊ Û DIYEN AYENDÈ

tacîdar peyda kir. Bi vê bijartîne këmasîke mezin wê bigihaştâ malbatâ wê. Ji xwe wê ji ev dixwest, da ko heyfa xwe, ji dê û birayê xwe hiline; ji wan her du zilamén ko keti bûn navbera wê û evina wê. Honaryayê ji xwe re Etilê bijarti bû.

Etilê ew hikimdarê zâlim û wehşî bû ko gava welaletê vedigirt ji xwina mirovén ko serjédikirin çem didan herikandin û bi sefr û ken digote xelkê dora xwe: Dera ko hespê min pê lê dike giya nema lê şîn dibin.

Etilê pişti ko Kestenteniye saffî kir berê xwe da imparatoriya romanî ya roavê.

* * *

Ma diya wê, ji Honorye re ne goti bû ko ji xwe re ji nav mîr û melfikan mîrekî bibijêre. Etilê, ma jê meztir hikimdar hebû. Etilê dinya vegerî bû; mîr û mellekîn dînyayê xulamîtiya wi dikirin.

Honorye rabû ji Etilê re nameye nîvisand û digel hingustilekê ew şande hikimdarê xwîn-rêj. Di nama xwe de, xwe pêşkêsi wî dikir û digot ko dixwaze bibe jina wi.

Pişti ko qasidê Honorye bi rê ket diya wê pê hesiya; eniri. Da egilê xwe, qerara xwe da. Ewê keça xwe ji dînyayê nependî bikira. Hebû ko bi vi awayî evina xwe ji bîr bikira.

Di şeveke tarî de mewkibeke imparatorî ji Ravnayê bi rê diket. Erebeke depdepe; li pêş û paş û di her du ali-yen wê de siwarine zirehpûş. Di erebê de Plasidya û Honorye rânişti bûn. İmperetoriçê keça xwe tê de hepis kir û vegeriya qesiit.

Erebê da hevrazê û qedereki çö; heta gihaştî ber deriyê avahike bilind, wek kelehekê. Ev dêra tarikêni dînyayê bû. İmperetoriçê keça xwe tê de hepis kir û vegeriya qesiit.

Honorye kete bel-gîhê rahban û li ber qedera xwe a reş stoyê xwe xwar kir.

* * *

Qasid gihaştî qeragaha Etilê û bi dari ket; name û hingustî ber pê kirin. Etilê li vegerand û got:

— Navê mira Honorye bi guhê me ve bûye. Dibêjin ko mîra romani çeleng û spehi ye. J ber hikimdarê xwinrêj ve jê re bibêje: « Melik Etille, xezeba Xwedê li rûyê erdê, hakimê kîşwer û welatan, qesabê serê mîran, jina ko ew b xwe dixwaze, ji xwe re tine. Ne hewce ye ko mîrekê romani nefsa xwe jê re pêşkêş bikin. Etille jina ko dixwaze bîkeve paşila wi heke di qesiran de peyda ne kir; heye ko wê di koxikan de peyda bike. Dî pêşya leşkerê xwe de emê di ser sûrehên Ravnayê re derbas bibin û textê imperotorê romanen hilwesinin. Ü heke me mire Honorye ne eciband emê jê re bibêjin ko xwe bigehine navmaliyên me. Te seh kir?.... Niho here.... »

Rahbeke pir, di dêrê de, berê xwe da habisa Honoryê û di dehlizan re, hêdi û bê deng diçû. Gava gihaşte ber deriyê mîrekê destmalta xwe derxist, hêstir ji çavêن xwe maliştin û li deri da.

Honorye rabû ser xwe, hêstirên çavêن xwe ziwa kirin û deri vekir. Rahbê got-ê: Qasidek ji Ravnayê hatiye û dixwaze mîrekê bibine.

Honoryê serê xwe hejand û Rahbê qasid derbas kire hundir.

— Lûsyos tu kengê hati?

— Ev bûne sê roj ezbeni.

Qasid Lûsyos tiştê ko Etilê goti bû-yê gote mira xwe. Honoryê deng ne kir. Pişti bîhinekê jê pîrst:

— Li Ravnayê ci heye, ci nîne?

— Xwe kar dikin, ser nizing bûye. Herçi diya te li ser inada xwe ye.

— Ü ew... çawan e?

— Ki?

— Ew.. ma li Ravnayê jê pêve kes heye ko ez pê bendewar bibim....

— Mireka min, peyayê ko tu dibejî, yê ko te hejî wi dikir, nema di nav zindîyan de ye.

— Kuştine?....

— Nizanım, kuştine an wi xwe kuştîye. Tiştê ez dizanîm uema di jiyyînê de ye.

— Belê kuştine... ji rikê min ve ew kuştine..

Honorye rabû; ji piyan sekini. Çavêن wê ên ji hêstiran nermbûyi ji nişkekê ve bi hiskahîya hesineki hişk bûne û pêtin jê cûn. Honoryê gote qasid:

— Vegere Ravnayê û ji diya min re bibêje ko bi ve kîre hisên dilê min kuştine; ez nema ji dêrê derdikevîm. Ü careke din here nik Etilê û jê re bibêje; keça ko dixwaze bibe jina te, ewê ji te re nîvê imperatoriya Romayê bi xwe re blîne. Bila bisîne pey dê û birayê min û min



CİNDİKÎ EMERİKANÎ DI GUNDEKİ SİCİLYAYÊ DE ESKERİNE TALYANÎ TESLİM DIGIRE

bixwaze; pê re ji nîvê imperatoriye. Ji wan nayê ko daxwaza Etilê bi şûn de vegezinin.

Heyetek ji ba Etilê hati bû Ravnayê. Heyetê ji Valantinyos re nameyek anî bû. Etilê xweha Imperator, Honorye dixwest; pê re ji nîvê imperatoriye.

Valantinyos daxwaza Etilê bi şûn de avêt. Diya Imperotor, Plasidê — ji xwe işe hikûmetê ewê digerand — fermandarê Romayê gîhandine hev û leşker berê xwe da sinoran; bû şer.

Çend sal ketin navê. Honoryê di dêrê de di nav rahban de ibadeta Xwedê dikir; dê û birayê wê di qadêن ser de cehda xwe dikirin ko li ber eskerên Etilê bisekinin.

Di rasta Ketalyonyayê de Etilê şikest. Hemî Ewropayê got ko dinya ji bela wi xelas bûye. Leşkerê wi ji sînorêni imperatoriya Romayê bi dûr ket.

Zemaneki dirêj kete navê. Ewropayê péjna peyayê ko digot « ez li rûyê erdê xezeba Xwedê me » ne kir.

Valantinyos ji işe ziwaca xweha xwe bi Etilê re ji bîr kiri bû. Honorye di dêrâ tarikên dînyayê de roj digîhandin şevan, sev digîhan-din rojan.

Rojekê ji tixûbêni imperatoriye qasidin, bi hawarî gihaştiine Ravnayê.

REQE AVĒ

Beri çendekē du balaſirvanen britani keti bün behirē. Di ser behirē re li wan da bün. Lē balaſirvan dema diken; flūqa kewçük ya ko di balaſir de bū; bi xwe re biri bün û ew nepixandi bün.

Balaſirvan di flūqē de rūniſti, li dūrahiya behirē dini-hertin û li hēviya vaporekē diman. Vaporek wē biboriya û ew xelas bikirina.

Ji nişkekē ve flūqe hejiya. Qey tiſteki di bin re dehfı dida flūqē. Balaſirvanan texmina noqavekē kiri bū. Digotin, heye ko noqavek li binē behirē ye û dike derkeve rū. Zükü bi çend derben bēran ji wē derē bi dūr ketin. Lē flūqē ji nū ve hejiya. Ma noqavē di bin re dida pey wan. Ji xwe vē carē flūqē welē hejiya ko qey wē ji cih rabiwa û bi hewa biketa.

Lē piſti bibinekē flūqe

dant û di rex wē re serē cenawireki xuya kir. Seriki gir, stoki dirēj û çavine cilmiſi. Wi tebayi mideki li balaſirvanan temaşa kir û noqi avē bū.

Heri tiſt dibate bira balaſirvanan. Cenawirē behirē, yē ko peyakî an golikeki bēi ko bieh dadiqurtine... marē behirē... yē bi 10-15 gazañ dirēj....

Bivē nevē tirs giha bū balaſirvanan. Ew di van texmina de bün ko wi tebayi ji nū ve xuya kir, noqi avē bū.. çend carēn din xwe şanı da.

Balaſirvan bēj nū ji mirinē xelas bū bün. Gelo ji nū ve da bün riya hat-nehatē. Qerara xwe dan ko li ber xwe bidin.

Di binē flūqē de weriseki dirēj hebū. Balaſirvanan ew xiste destēn xwe û gava serē wi tebayi ji nū ve xuya kir, bi weris bera wi dan. Teba noqi avē bū weris ji ji destēn wan şemiti û bi lez çū; qey yeki ew ji behirē dikişand. Dawiyē werisē dirēj nema çū û sekini.

Etilē, ji nū ve, berda bū tixübēn imperatoriyē; pêşdarēn wi qesta Ravnayē dikirin.

Valantinyos fermandar gihandine hev û şewireke giyan dani; esker şandine tixübān. Etilē dihat ji bona ko Honoryē bibe. Dē û bira qerara xwe dan. Ewē Honoryē bi yeki rehbizewicandina. Bi vî awayi Etilē bigiluştā Ravnayē ji Honorye ne dübū jina wi.

Ji nedimēn qesiē miroveki sei e bijaſti bün; wē bibiya mêtē Honoryē.

Honorye ji dêre deiexistin. Giregirēn welet vexwendin; daweta Honoryē wē şahinet bikerana. Valantinyos da zanin ko dost û hevalé wi fermandar Vlanyos wē bibe mêtē Honoryē û wē bibe melikê kişweke Romayē.

Honorye bê dile xwe bū jina Vlanyos.

Şahinetə dawetē hēj xelas ne bū bū ko qasidek ji tixübān hat. Etilē miri bū.

Şahi bi xelkē Romayē ket. Daweta Honoryē duta şahinet kiriñ. Honorye bi xwe di şinē de bū.

Etilē keçekē qranen Germanistanen anî bū. Di şeva dawetē de Etilē serxwes keti bū. Keçikē

Balaſirvanan serē xwe rakin û li dora xwe nihert. Çi bibinin, vaporeke ingilizi e piçük li nizingi wan sekiniye. Vapor hate rex flūqē û balaſirvan bilkişiyen ser.

Balaſirvanan gava ji kaptanē vapore re biserhatiya xwe qise kiriñ û qala 'wi tebayi kiriñ jê zanin ko ew teba reqe behirē ye û xêra wi vapore ew ditine.

Belê balaſirvanan gava bi weris li reqe avē da bün req weris kiri bû devê xwe û çû bû heta nizingi vapore û li rex wē da bû rû. Xelkê vapore gava regek, di devê wi de weris ditin li xwe hişyar bün û dora xwe testiş kiriñ û flūqa balaſirvanan ditin.

Kaptan gote balaſirvanan: Herweki min ji we re gotiye ew teba reqe behirē ye ûdi van behiran de gelek ji van heywanan têne dltin. Heywanine bêzerer in; lê carina henekan dikan û pê xelkê ditirsinin.

DILAWER ÇARPİNE

ji yeki din hez dikir. Etilē mest û bêhiş û bêti ko cilén xwe ji xwe bike keti bû textê ziwacê. Keça qranen Germanistanen gava li mêtê xwe è bêhiş fedkiri, xencerâ wi ket ber çavên wê. Keçikê xencer ji kalan kışand û ew di şinê Etilē ra kir. Etilē nema hişyar bū. Şahi bi Europayê ket.

Honorye bi mêtê xwe re nikari bûbijt. Piſti kuştina Etilē, birayê wê ji nema zor dida-yê. Honorye terka mêtê xwe da û vege-iya dêrê. Qewiti li rahban kir û got: Ez ji wek we rahbek im; ji niho û pêde min bi awaki din bi nav mekin. Ji min re ji bi tenê Rahbe dibejin.

Honorye di dêrê de çiqas emir kir, kest pê nizant.

Imperator Valantinyos beriya xweha xwe û di sala 455an de mir.

Di gortistana wê dêrê de kélék heye, kéléke sade û rahet. Li ser kêtê ev gotin nivisandi ye: RAHBE.

Dihok: 24 Tirmeh 1943 BIŞARÊ SEGMAN

NÉCIR

« Ji axayé min é delal, gêxé »
« néçirvanan Lezgin axa ra »

— 2 —

Dî hejmara Ronahiyê a 16an da min bendek li ser néçirê, néçîra ko di welatê me da dibe, nivîs bû. Ji ber ko bend pir dirêj bû bû, min hin néçîr serpilkî nivîsin û néçîra teyran ji hêlek hiştî bû. Herwekî di dawiya bendê da min ji xwandevanên Ronahiyê ra goti bû, ev e ez awayê xwedî kirin û daxistina teyrén néçîrê ji bi bendeke xweser berpeyi wan dikim.

Yek ji di benda berî vê da min néçîra kîvroskan yekcar serpilkî nivîsi bû. Ji ber ko her kes agahî vê néçîra han e, min ne xwasti bû bi dirêjkirina wê xwandevanên delal kiz bikim. Lê paşê, xwedîyê Ronahiyê di vi warî da gazind li min kir. Li ser daxwaza wî ji, di dawiya bendê da ezé careke din vegekim ser néçîra kîvroskan.

XWEDIKIRIN Û DAXISTINA TEYRAN:

Dî benda berî vê da me goti bû ko dema teyran bi torê digirin, her du çavên wan didirûn. Qesda wan ji çavdirütinê, ji bo heyâ hîni dengê mirov bûne ko netirsin. Pişti ko teyr çavdirûti û pergirêdayî digehê destê néçîrvanê xwe; berî her tişti jê ra sê tiştan pêk tîne:

1 — Kostek, ji germekî nermû delal tête çekirin ko dikeve her du lingên teyr û ji bo pê girtinê dûvikêk pê va ye. Ev dûvik ji bo pê girtina néçîrvan e. Di serê dûvik da xelekek heye ko benekî xurt û sê-çar gazan dirêj ji pê va dikin.

2 — Venişték, ji sê daran tê çekirin ko weki

kursiyekek ye. Ci gava kostek existin lingên teyr, li ser venişték datfnin û benê bi kostekê va bi venişték va girêdidin; da ko nefire.

3 — Lepik, ev ji ji germekî xurt tête çekirin, da ko néçîrvan têxe destê xwe û teyr rake ser. Ji ber ko rojê du-sê caran gerandin teyr divê, bê lepik rakirina wîne mikün e; di roja pêşin da pêkanîna lepikê hewce ye.

Pişti ko ev her sê tiştêm han pêk hatin, deh rojan teyr çavdirûti dimine û rojê du-sê caran tê gerandin. Rojê du caran ji jê ra goşte mirîskan tê dayin; lê bi şertê ko têr nebe. Di roja pêşin da heyâ ko qenc dadikeve néçîrê, têrkirina têr ne dirist e. Teyr çiqas qels û jar bikeve, ewçend zû dadikeve néçîrê. Teyr xurt û qelew, kêm caran dadikevin néçîrê û pri caran di çaxa daxistinê da direvin.

Gava roja dehan hat, çavên teyr di nav komek peya da vedikin. Ji ber ko di vê demê da hîni deng û pêjna mirovan büye, nema ditirse û hovitiyan şanî dide. Ji vê bi sun da, wî hîni seyên néçîrê dikin. Edî ci gava bibin gerê, divê se ji bi néçîrvan ra bin.

Heftekê ji ko holê derbas bû, benê bi kostekê va bi qasî bîst gazan dirêj dikin. Edî ji wê rojê pêva nema wekî berê goşt tavêjin nav lingên wî. Divê néçîrvan dûri venişték bisekine û goşt râveyî bike û « hay » ke. Bi haykirinê ra li néçîrvan dinêre û goşt dibine. Hîngâ bi firekê ra li ser destê néçîrvan vedine û goşt dixwe.

Pişti ko deh rojênen xwe ji holê derbas kirin û hineki çetir aşine bû, bi navê « gurê » benekî du sedsê sed gaz dirêj çedîkin ko daketina teyr hîngê dest pê dike. Gava dixwazin teyr li ser gurê berdin, divê li nava gund bi derkevin û herin cihekî dûz. Vê care li suna lepikekê dudu divê. Ji ber ko her seriyelek gurê mirovek pê digire, wê gavê, benê ko bi xeleka kostekê va vedikin û serê gurê di nava xelekê ra derbas dikin.

Dema mirovê hember hay dike, teyr bervê dinirê, goşt di dést da dibîne û difire diçe goşt. Bi vi awayf her du mirovên ko bi seriyelek gurê girti, her yek çar pênc caran gaziyê dike û pişti ko du nikul goşt bidê, ê mayî jê didize. Ev kira han her roj du caran di demen taştê û şiva teyr da çedibin.

Roja pêşin li ser gurê, car



SSS HAWIZEKE VAPORAN YA BEHRIYA EMERIKANI SSSS

caran teyr revê dixwaze. Lé gava'nikare xwe ji gurê xilas bike, édi revê ji bir dike û dixwaze zikê xwe holê têr bike. Çigasa roj bi nav da terin teyr ewçend aşine û hîn dibe. Bi vê rézika han kijan teyrê çetin be, di bîst rojan da li ser gurê fér dibe. Çi gava di firinê da têr xwe berda biniya gurê; hînga nêçîrvan bawer dibe ko teyrê wî kedi bûye. Ji vê xwe berdana teyr a bin gurê ye, ko bi hînkirina teyr a nêçîrê ra daxistin dibêjin. Anê daketina teyr a bin gurê.

Ci gava teyr qenc di bin gurê ra 'firî, sê-çar rojan jî disa du mirov, lê bê gur, wî hay dikin û şfv û taşteya wî didinê. Paşê hînga dikarin bibin nêçîrê.

TULE-BÜNA* TEYRAN:

Her sal di cilê Havînê da teyrê nêçîrê pûrta xwe diweşinîn ko bi vê ra « tûle » dibê-jin. Tûle-bûn nîzîkî sê mehan dûm dike. Çil rojén pêşin pûrte diweşîne û cil rojén dawiyê pûrt pê té. Di vê midetê da, teyr pir qels bibe û hewcîyi xizmetekî mezîn e.

Di meha Biharê a dawiyê da divê nêçîrvan di odeya ko dike teyr bi xwedî bike da hin qesil (hêşinayî) biçîne. Gava ket serê Havînê, pûrta teyr rengê xwe digihare, pîrçazkî dibe û dest bi weşînê dike. Hînga divê nêçîrvan kostekê ji lingên têr bi derxe û berde nava odê. Herweki di héleke odê da qesil heye; li du hélen din yekê testek av û yekê ji hin axa paqîj datinîn û derfî li ser dadîdin. Rojê carê divê qesil bête avdan, ava testê bête gîharîn û ax bête tevdan. Teyr jî her roj sê-çar caran di qesilê da dicêre, di testa avê da xwe dişo û di axê de vedigezive. Di vê midetê han da kêm caran ji teyr ra goşt té dayîn. Pîşti sê mehan pûrteku nuh pê té û vedigere halê berê. Teyrê ko Havînê ev tişîten han jê ra pêk neyên, pûrta wî pir kîrêt diweşê û kîrêt hisin té û nema bi kîrê nêçîrê té; ji ber ko perên wî xar û belovaca hisin tê û bi kîrî firina xurt naye.

Nêçîrvanê teyrê nêçîrê, her sê mehîn xwe ên Havînê bi tevayî di xizmeta teyr da dibore. Ji bo vê ye ko her kes nikare wan bi xwedî bike û ên ko bi xwedî dikin jî jê râ xulamekî xweser dirigin da ko direjîya salê pê mijûl bibe.

NÊÇİRA KEVROŞKAN:

Ji ber ko di benda berî vê da min nêçîra kîvroskan serpîlkî niîsi bû; li ser daxwaza xwediye Ronahiyê careke din em vegerîn vî warî. Nêçîra kîvroskan bi tajîyan geleki e xwes e. Ji ber ko çar-pênc salan min ev nêçîr kiriye; pir û hindik agahiya min jê heye.

En ko ev nêçîr ne kiri bin, welê dizanîn ko

ev nêçîr ne hwceyî zanînê ye. Bi tenê kîvroskan girtin karê tajîyan e. Lé a rast ew e ko di nêçîra han da agahi û serwextiya nêçîrvan du par û surîf û jêhatî bûna tajîyan pareke nêçîrê ji xwe digire. Ew tajîyê ko di destê nêçîrvanekî nezan da rojê du kîvroskan bikare bigire, tezez di destê nêçîrvanê serwext da pênc-şes heban digire. Zanîn û serwextiya nêçîrvan di warê han da ye.

1 — Perî her tişî cihê ko kîvroskan tê da vedişire çak nas dike û berî ko birinê tajî bîskê jê ra kîvroskan radike.

2 — Merasê xwes digire; da ko kîvroskan



DI QADA SICİLYAYE DE: ESKEREL

dûr baz nedin. Kêvroskên ko dûr baz din pir caran li pêş tajîyan wenda dibin.

3 — Kêvroskê xurt an qels [1] ji cihê wî dizane û tajîyê xwe bera ê xurt nade.

4 — Heke ji tajikî pirtir bi néçîrvan ra hebin, yekfî li bilindcîhan dihêle. Ji ber ko her du lingên kêvroskan ên pêşin ji ên paşin pir kintir in, her dem çavê wî li bilindcîhan e; çima ko li ber kaşan pîr xurt direve. Gava néçîrvan tajîyekî xwe li gazê dihêle, heyâ kêvrosk digehe gaze qenc diweste. Hîngâ ew tajîyê vehêfî bi gengazî néçîra xwe digire.

Di vê néçîra han da awayê xwedikirina

tajîyan jî hewceyi hinek zanîn, an bala xwe danê ye. Ev xwedikirina han jî bi pékanfa çar tiştan dibe:

1 — Xwarin, di heftê da qe ne çar caran şîrans û çar caran jî avsîr (ji rûn an ava goşt û nan û sîre çêdibe) dayîn.

2 — Ji bo nermhiştina piştä tajî cileke berkulay û germ li piştë şîandanîn.

3 — Heftê du caran piştä tajî bi ava germ û sawûnê şûştin û qenc misîdan.

4 — Ji bo parastina birinê tajî, her gav girêdayî hiştin.

Ji bo vê ye ko her pênc mehêm néçîrê (mehek paž, sê meh zivistan û mehek bihar) néçîrvanê serwext tajîyên xwe girêdayî dihêle. Bi tenê rojê sê caran digerîne.

AWAYÊ NÉÇÎRÊ:

Néçîra kêvroskan bi tajîyan; awayê çaktir, bi girtina merasê dibe. Meras, 'di rex' hev ra meşîna néçîrvanan ra, tê gotin. Dema néçîrvan degehêن cihê néçîrê, weki kevaneki an hîva nuh nfvgovendekê digirin û di erdê bi guman da dicin û tênen. Di pêş û rex xwe da ci hij, dirf û tûpêن ko bibînin kevir dikan. Divê navbera her du peyan sê-çar gaz hebin. Gava fireyiha navbera peyan ji vê pirtir be, pir mikûn e ko kêvrosk ranebe.

Heke tajî yek be, meras jî li goreyî wê kin tê girtin û tajî dixin nîveka merasê. Na gava tajî dudu bin, her yekfî didin hêleke merasê. Heke tajî ji dudûyan pirtir bin ên mayî diexin nîveka merasê. Lê her hal tajîyên qenc didin peran û ên qels diexin nîvekê. Merasa ko çak bête girtin, tê



ILIZİ PIŞTÎ ŞEREKİ SINGOYÊ KETINE ÇEPERÊN DIJMIN

P I R A T O R È

Hilkisi me çume jorê her du rex min bend ú rez
 Min di pirek tê ji tarê ker di ber da tê bi lez
 Hate nîzîk rojbixkerek da û wek min dil bi xem
 Pirebi bû por-sipî bû taqî-res bû rî gewez
 Min ji pîrê xwes dipirsi. ey metê tu j'kû ve tê ?!..
 Go ji Sérîlê dîçme Bérîlê, xâniya romî me ez
 Xan à eywan kirne wêrau mîr à jin ser jê kîrin.
 Min go pîrê qey tu kurd i? cüge tilgên xwe bi gez
 — Belki benda rez bi guh bil dengê xwe pîr hilmekê
 Pir ditîrsim ez ji derbê singûlîromê teres.
 — Min digot: axa ú beg; wê go: kurê min guh medê
 Ew sivan in sermiyan in dane gurgan colê pez
 Min kurek tenha heye ew şandî bajêr medresê,
 Wê du sê pirs bo me goti pê helandi cerg i bez,
 Goti dayê em dixwînin wek Cegerxwin gotlige;
 Zû bixwînin hev bibînîn biçne Kurdistan bi lez.
CEGERXWÎN

da këvroşk dûr nareve. Heke këvroşk dûr
 nareve, tajiyê çak di nîv kilometre û hîn hindiktit
 da digire.

Këvroşk ko bi çavpehni teresiye hatine
 nasîn, carcaran ranabin. Qewimiye ko nêçîrvan
 pê li serê wi kiriye û di bin lingê xwe da
 girtiye. Ji bo vê di girtina merasê da dive nêçîrvan
 gelekfî serwext be ko këvroşk bi sun
 xwe da nehèle û jê derbas nebe.

SOWA (CINS) TAJIYAN:

Sowa tajîyan jî wek ên hespan gelekk in; lê
 ne bi nav û binyat in. Ji bo naskirinê, sowa
 hespan bi navê xwedîyên ko li cem hatine
 nasîn; lê ji bona tajîyan tişteki holê ne fikirîne.
 Bi tenê, ên ko tajî pir bi xwedî kîrine
 dizanin; an bîr dibin ko wek hespan, an mina
 seyên mayî tajîyan jî sowen wan ji hev cida
 ne. Herweki me li jor gotî, çîma ko ji her
 soweke ra navek ne hatiye xweya kîrin, di
 vir da emê nikari bin sowen wan ji hev ve-
 getinîn. Lê di vî wart da di destê me da
 delilek heye ko ji tajîyen çak cewrêñ çak, ji
 ên békér jî cewrêñ békér dadikevin.

Ji bona zanîna çakiya tajîkî çend nîşanîn
 ko nêçîrvan tajiyê çak ji é békér bi der diexe.
 Serf: tajiyê çak bêvildirêj û qoçê seri tuj
 û bîlind dibe.

Pîşîr: pîşîra fere û daktef nîşana xurîf û
 revê ye.

Pîşît: kîjan tajî müfirkên pîştê zêdetir bin
 ewçend beza dibe.

Bi van nîşanên han ji nêçîrvanekî ra
 mi-kûn e ko tajiyê jêhati ji é békér binase. Pîşît
 ko me benda xwe hinde dirêj kir, heke me
 xwândevan hinekî serwext kiri bin ew jî baş e.

OSMAN SEBRÎ

[1] Këvroşkên qiracan, nemaze ên ko di ber
 kaşen bi çeqçeq da bi cih dibin gelekkî e beza û
 xurt in. Ev celeb kevrosk e pîşîşin in. Këvroşk
 kepîr û ciyan ne ewçend e xurt in û sorik dibin.

HEY KURD

Ser ji xew rake binêre ro ji bircê da der e
 Guh bidêre çarkenarêñ te bi halan û şer e
 Zani beşey millet im ev dem nezîya razan û xew
 Ev dema gurmên û ceng û top û tip û lesker e
 Sed weki Guhderz û Ristem wan bi te'deng
 [da cihan

Ma ne şerm e ko di fro mayî bê mîr û ser e
 Pir nexwes f ev du sed sal bû li te jana zirav
 Şex û axa bûne mîqrob ketne laşê tey zer e
 Dijminê mezzîr ji van bê xwendin û nazanî ye
 Korf û nayekîf û bê bexîf zanim sê ser e.
 Ev welatê wek bîhuşt bû, bûye zîndan gor û

[teng
 Dil û gerden-xwar f tek da bê şibakû pencere
 Ev ci ye ey millet im bê dost û dijmin bê jîmar
 Reçika ko şex û axa dane ber te, tê mere.
 Şex ne dîlxwazê te ye, lê rencherê navê xwe ye.
 Tekyexana wi di vê tê da heblin çend kerker e
 Ew bi xwe parsê dikin kengê Xwedê ev gotliye?
 Ma kiramef tîzîf ye, yan top û tang û qumbere?
 Xaniye axa mezin her dem di ser gundan bilind
 Lis û hîlîna dizayê wek şikeftan sê der e.
 Ma ne bes ey millet im van rîp û xapan ber.
 [de zû
 Ev riya rast û dirist e, bes Cegerxwin rîber e.

CEGERXWÎN

X I Y A L

Ey bira hon çend şîrîn in ber dilê boti gelekk
 Cû ji dest me ev welat û Şernex û Birca-belek
 Deşî û zozan û çiya ew mane bê nêçîr û rav
 Deşî û zozan bi tixwîb in, bi Gever paşê Şîkîr
 Qedrê vê axê bizanî me'den e tev de bi zér
 Xemîl û rewşa vê Çiravê, Kaniya-reş warê Mîr
 Xwezka ez tê de sivan bam, min bixwara nan
 [û şîr
 Ser ber û ferşan dibinim şiklê nîsk û cew,
 [genîm.

Ev welatek pir ecêb e, ez ji kîfan dikinem
 Ger bi sé mangen Biharê, lê bîmînî ta Pehîz
 Ma ci ye Lîman-û Monblan[1] zêdetir sed car
 [eziz
 E nedîş ci dizanit em ji ci behsê dikin
 Her tenê em pê dizanîn lewre hinde dilkul fî
 Botiyê békés erê hîvî heye âdi biji
 Pişît van xewin û xiylan te ne ma' eqî û mejî.

M. E. BOTÎ

(1) Gol û çiyayine Swîçrê.

SÈR Ú MIŞK Ú ROVİ

Carekê sér li roviyekî rast hat ko hirmekî di devê wî de ye. Çaxa çavê wî li hirmiyê ket; ji rovî re got: Seyda ev ci ye tu dixwi?

— Ezbenî, hirmê ye

— Hirmê ci ye seyda?

— Hirmê bi daran ve çedibin; tiştekî sérin ú xweş e.

— Li kû peyda didin ezbenî?

— Va ye, li serê vî çiyayı, bêjimar û pir in. Te divê em herin şanî te bidim.

— De fermû seyda em herin

Her diwan dane rê ú çün; li hirmiyekî rast hatin. Qurmê wê stûr ú serê wê bilind; hirmê lê xuya dikin. Sérê dilbijok dey li rovî kir ú got:

— Seyda, çawa têne xwarê?

— Ezbenî em rovî dûvê xwe lêdixin ú diwêşinîn, zû zû...

Sér dûvê xwe dawêşand-e ú lêda. Lê tu kér pê ne kir. Li rovî zîvîr ú got:

— Ezbenî ka naweşin.

Wî lê vegerand ú got: Ezbenî xurtiya we şeran di nav milên we de ye, pişta xwe bidi-yê ú bihejinî.

Piştî ko sér pişta xwe da-yê li seyda

vegeriya ú got: Ka nakevin ezbenî

Rovî çavê wî li fen ú futan bû. Jê re got: Ezê te bi darê ve girêdim, da tu kari bî darê bihejinî.

Sér got: min girêde.

Roviye çeleng ú sivik hinek roviyên dewaran anîn û li bêjina sér ú darê, ji qirikê heta neynûkan gerand ú lê hişt heya, danê évarê. Rovî tiliya xwe lê da, dî ko hişk büye ú tingîfî jê té. Dey lê kir ú got:

— De xwe veweşine ú bihejîne.

Çawa sér xwe veweşad, parsiwên wî gihan hev. Sér li rovî vegerand ú got:

— Rovî mal-wêran, zû min veke; lê ez mirim.

Rovî lê vegerand ú got: De bimire sehê pîs. Ji berê de me sér bi daran ve girêdane; da yekî dî weke te bi vî çiyayı nekevi.

Rovî wilô got, da rê ú çû. Çend rojan şerê xwînxwar ú merkuj bi darê ve girêdayî ma. Paşê mişkek li biniya nigê wî çû û hat. Sér li biniya xwe nerf ú got, ev kî ye. Gidiyanî, bê tu min venakî, ez mirim.

Mışk serê xwe rakir ú got: Paşa kê wilo li te kiriye. Dilê min li te dişewitê. Lê ji berê de hon mezin ú serek hevalen pîs ú qesme-ran in. Ne em bin, herdem rovî ú teba wê wilo li we bikin.

Sérê girêdayî ú gerden-xwar nikare dengê xwe bikê ú tiştekî lê vegeşnê. Bi tenê bi lavlav ú dilek jê hêvî dikir ú digot:

— Ezbenî, de ka min berde, paşê emê ji xwe re bipeyîvin.

Mışkê guhpan ú bilind serê xwe rakir; çû û hat, bi diranan serîki duhêlan jêkir ú li darê zîvîr.


Piştî ko sér ji vî derdi filîf li xwe û li müşkê bi paye ú tirek dinêri ú çav lê sor dibûn. Sér tif xwe dikê ú di dilê xwe de dibêjê; Tift li vî welati be ko rovî mirovan girêdidê ú müşk mirovan berdiidê.

Sér dil-nexweş ú serberjér da rê çû... her çû.

Dibêjin ji wê çaxê de sér di welatê me de ne mane.

Amûdê: 29/7/943

BRAHİMË ISA



ŞAGIRTÊN DIBISTANEKE LONDRE

DIROKA

JINA NAPOLYON

« Gava welaték bindest hù, ji welatié bi rümet ra bistené riyek dimine; Di riya serxwehdn ù azadiyé da mirin ».

Napolyon

— 2 —

JINA DIBISTANÉ:

Bi qasi ko diroknivisan der heqé jina Napolyon a tevayı da pir ù hindik zanineke têr gihadine ber desté me; di aliyé jina wi a dibistané va gelekti bi sun da mane. Gava ez diroknivison dibéjim, bi tené qesda wan camérén ko nivisarén wan għane me dikim; ané diroknivis, an nivisenané rohelata nizim. Heyeko diroknivisén Ewropayé, nemaze ēn frensizan ev aliyé han ji bi temamni nivisi bin, lè mħabbin ko ji neagħahiha me a zimmané wan, em ji nivisana vē hēla diroka serdaré freng bē par kirin. Ji bo vē ye ko em, di vi warl da bi nivisana vi tištē hindil bes dikin.

Gava Napolyon pē kire sala sesan, bavé wi, ew li Ejaksiyyé existe dibistaneke destpékta (ibtidai) da ko tē da pēsiyén xwandin ù nivisandiné hin bibe. Tevi biċċuġi xwe, Napolyon bi sergermti ù serdtiġi xwe di nav hevalan da xweya bù bù. Hingé bi ser tū pēċċa xwe gelekti t-di heydaketi bù. Pir caran bi rē diċċi, goré wi dadiketin ser rūyé pélavé ù di xwe ra ne didtn ko hilkiżnejne. Bi carekē nizani bù, an hez ne dikir ko weki hevalan ser tū sekeyé xwe giréde ù xwe dūzan f'bike. Tevi yeka han ji gelekti ji xwe t razf u kes di ser xwe ra nedizani; an ne dixwest bi vē yeka han bawer be.

Dibéjien di vē dibistana han a biċċuk da keckehe heft-heşt sali hebù ko Napolyon pir mela xwe dabu-ē. Di demen veħensiné (teneffis) da, Napolyon ħer biċċuk desté xwe diexxist desté keċċik ù pē ra digerti. Bi vi halé dihevdaketti hevaliġa wi bi keċċik ra, hevalen wi pē dikendan ù dikirin armanca tewz ù tinazén wan. Napolyon ji van tewżen ġavnebar, gelekti kiz dibù; lè herwekk nablitiye, di xwe va derbas dikirin. Ci gava tinazker xam dikirin ù bi peyiv ù axażżeñ dilehiyan; hingé xwina wi a korsiki di rehan da germ dibù ù bē ko dawiyé birame an piraniya wan bifikire, weki biruksxé xwe davete ser wan. Bi destsivikiyeke



ecēb, bi kolman ù pinan welē li herçar hēlan dixist ko ēn pēs xwe mat ù şas dihiştin ù direvandin. Paše bi dilgħi qedigert cem hevala xwe ù disa desté xwe diexxist desté wé ù ji nū va digerti. Bi vi awaif tirseke ecēb xisti bù zikē berber an ġavnebarēn xwe. Ev bi kér-hatini u serutli li aliki ù hezkirina dengħi topak kiċċik ù listika wi a bi zarokan ra ko bħenna rē ù rézanen leşkeri jé dihatin li aliyé din, ramana exsistina Napolyon a dibistana herbiyé da ber bavé wi.

Piġi ko Napolyon dibistana destpékta a Ejaksiyyé kuta kir ji bo ko bikari be here dibistana herbiyé diviyya bù hinek zimané firansizi hin bibe. Ji bo vē yekk bavé wi, ew tevi birayé wi Jozef existe dibistana Ottiné ko ċend meħan tē da bingħeżżeż zimané firansizi f'er bibing da ko bikari bin di dibistana nuh da bi hevalen xwe ēn pēsende ra bixwinin.

DIBISTANA BRIYAN A HERBIYÉ:

Hingé li nav Fransejé diwazze dibistanen herbiyé ën destpékta hebùn ko ev dibistana Briyān yek ji van diwazdehan bù. Her sal ji sefèn van her dibistanekké è dawiyé sè zaroġken bi kér-hattin dibijartin ù dišandan dibistana Parisé a herbiyé: ji bo ko tē da zabit

bi derkevin. Şagirdên dibistana Briyenê ji wek dibistanê herbiyê ên mayî hemî ji zarokên malmezinan bûn. Wê çaxê hemî malmezinan zarokên xwe bê dibistanen herbiyê ne diexistin ên din. Bi çav wan bijiskî, avokafî, mihendîsi karê wan kesan bu ko nizanîn bikujin û bimirin. Di demeke holê da û bi aqîle han, gava kurê malmezinan bi berikên tijî, gûri û oflazî di dibistana Briyenê da dixwandin, kurê avokat Karlo Bonapart Napolyon bi berika xwe a vala hat kete nav vê koma torinan. Ew te ri-nêni ko dema xwe bi listik û henekan dibordanin û bi nav û ritbeyen hav û malbatêni xwe bi ser hev da gûrî û oflazi dikirin, Napolyon di nav xwe da tişteki békér, reben û qesmer diditîn. Heke li súna Napolyon zarokefi din bûya, teqeze dê xwe di nav wan torinêne dewle-mend û serbilind da pir biçûk bidita. Lé Napolyon bi vê yeka han serinizim ne bû. Ji xwe serbilindi û oflaziya hevalên wî a vala bû ko canê wî ê gewherfeşan ji vê bérêtiya han hişyar kir û ramana bêbihatiya malbatan li ser kuran di wê demê da éxiste dile wî. Di vê dibistanê da ji ber peya malbatî û dewle-mendiyê Napolyon pir tehfî ji hevalên xwe dfti bûn ko di rojêni xurî û serbilindîya xwe da bi tenê rûmeta jêhatî bûn û bikérhatinê digirt.

Napolyon salên xwe ên pêşin di dibistana Briyenê da holê bi biyanf û dûrî hevalan

derbas kirin. Ew hevalên ko di nîzkiyiya wahda xwe biçûk û şermisar didit. Gava di nav wan hevalên gûr û qiros da ji xwe ra hogirek ne dît; bi carekê xwe avête himbêza kitêbên xwe û gelekî jê destkewîf bû. Destkewtineke welê ko bi her awayî xwandinê bi ser hevalên xwe ket û nema riya xwe di ser ra girtinê ji wan ra vekiri hişt.


Lê vê bi tenê mayîna han û xebata xurt a ko di geliyen wê da dikir, şopeke kûr û dûr li ser cendekê Napolyon hit û direjiya emrê xwe jê safi ne bû. Her pênc salen ko di dibistana Briyenê da derbas kirin û eş, derd û kulén ko bi hevaliya kurên malmezinan ra ditin, ji ber vê yekê westa ko gîhande xwe bejna wî gelekî qels û kin hişt; çima ko hîn cendekê wî xwe ne girti bû.

Di dibistanê da sê dersan bi carekê serê Napolyon girti bû. Hisab, tarîx û cixrafiya. Di dersa hishêb da ji biçûkiyê va jêhatî bûne-ke ecêb nişan da bû ko bi zîrekiya di vê dersê da hezkirina mamostayen xwe kar kiri bû. Ji bo vê, pir caran mamostan Napolyanê kiçik vedixwandin ser sıfra xwe û dilê wî ges dikirin.

Piştî vê dersê, kéfa wî ji cixrafiyê ra di-hat; her weki di biçûkiyâ xwe da ew karê mezîn (serekiya hemî Ewropayê) da be ber çavên xwe, her û her xerîte hîn dikirin. Heye ko Napolyn ji mamostan çêtir xerîte ji ber dizanin.

Hele xwendina kitêbên dfrokê (tarîx) mijûliya wî a her dem bû. Wi dixwast ji van kitêban rabûn û ketina miletan hîn bibe û ka peyayen mezîn qawân bi mîranî û jêhatî bûna xwe gîhane cihênilin-tir. Dixwast vê zani be, heya rojekê ko mezîn bû dê çilo xwe bigehîne nav û dengê peyayen dirokê û navê xwe di serhêla navê hemîyan da bide nivîsin.

Sala 1784an hat, Napolyon di sefe dibistana Briyenê é paşin da bû. Wê salê zivis-taneke sar hat û ber-fekê mezîn ket. Pêş û



KİMYAXANEYÊN İNGİLÎSTANË JÎ JI BO ZEFERÊ DIXEBITIN

dorhêlén dibistanê ji berfê û bisoyên wê hati bûn por kirin. Sagirtan nema dikari bûn bi lîstikên xwe ën adetf rabin. Ji ber vê bêhna hemiyan teng bû. Wê gavê tiştek hate bira Napolyon ko ji wê berfê kelehekê ava ke, dorhêlê wê bi bedenêke berfin rake û di ber wê bedenê da jî kozik û çeperan çêbike. Paşê sagirtan bike du biran. Birek di kelehekê da bimine ji bo parastinê, birê din ji bo standinê ji der da dirêjê bike. Vê ramana Napolyon li nik mezinan cih girt û emra çêkirina kelehekê, beden û çeperen wê spartinê.

Li ser vê ramanê, holê bi vi awayî, di rojekê da hemi sagirtan dibistanê keti bûn bin destê Napolyon. Ew weki ferfendarekî kevin û ceribî kete nava hevalan û keleh, beden û çepet bi wan dane çêkirin. Ew hevalan ko berfê çend salan bi çavekî kiçik li Napolyon dinérin, fro bê gotin di bin destê wi da dixebeitin. Bi şarezayiya Napolyon keleh, beden û çeperen di dorê da ewçend xwes çê bû bûn ko xelkê bajêr dihatin û bi çavîne ecêbeyî li wan dîwarên berfin en delal dinérin. Di wi emîre biçuk da, vê kira han ji mirovén dûrbîn ra didane zanfn ko Napolyon dê bibe peyakî mein.

Ser dest pê kir lê Napolyon ne kete nav her du hêlan yekê. Wi ji bo xwe di nav her du hêlan da ji kar dit. Herweki hevalan xwe kiri bûn du biran û yek existi bû nav keleh û çeperan; ë din li der ji bo erişê hiştî bû. Berê serekiya erişvanîyan dikir, gava didit halê midafan xirab dibe, hîngâ derbasî nav wan dibû û ji bo parastina keleh û çeperan nav di wan didan û serekiya wan dikir. Holê ji alîki derbasî ë din dibû, heyâ ko şerê han du heftau ajot. Di vê dema han da ewçend zanayî û jehâti bûn rave kir ko hemi temâşeker ecêbeyî hiştin. Di gerandina van şerîn gogê berfê da ji bo bicihanîna gotin û fermananê xwe ewqas serhişkî rave dikir ko rojekê zabitekî di cihanîna fermañeke wî da hînekî dudîl kiri bû. Hîngâ bê ko Napolyon bêje ev lîstike, bi gogeke zexm ew di erdê ra kir û birîneke welê di eniya zabit da vekir



TELÉFONA SEHRA YÊ
ko heya camêr i sax bû şopa wê birfinê li ser çavên wî ma.

Divê em ji bîr nekin ko ev sagirtê han ë ko di lîstika gogên berfê da zabit bû û bi destê Napolyon bi birfin bû bû, pişîf derketîna di dibistanê da geleki zîvar û desteng bû. Di wi deraxî da Napolyon ji bû bû imператор. Gava camêr ji bo destengiya xwe çareyek ne dit berê xwe da hevalê xwe ë dibistanê Napolyon û xwest bi darf wî keve. Dema berdevikan haya Napolyon kir; berê navê wî di ser hev neanî û gote wan: herin qenc serwexti bibin. Pişî ko berdevik serwextî rastiyê bû, vegerî nik Napolyon û gotê « ezenî, di eniya camêr da birîneke mezin heye ko dibêje ew birfin bi destê imператор bûye ». Hîngâ bi bîra Napolyon ket û bi rûyekî li ken got: « erê, ew birfin xwes tê bîra min; derbaskin bila bête nik min. » Hîngâ mîrik derbasî cem kîrin û daxwaza hevalê xwe ë kevin bi cih anî.

OSMAN SEBRÎ

HINDIK RINDIK

JAMA DÊRÊ:

Eskerekî mecerf bi navê Stéfan Javonî di eniya şerê üris de ker û lal bû bû. Stéfan midekî dirêj li rex topekê disekinf û topê pêde agir dikir.

Bijîşkan kir û ne kir ji Stéfan re tu derman peyda ne kirin. Izin dan Stéfan û ew şandin gundê wf. Rojekê Stéfan di ber dêrekê re derbas dibû. Jama dêrê bi xurtî lêdîda. Bi dengê jamê guh û zimanê Stéfan vebûn û mérîk vege riya halê xwe ê berê.

MIREKÊN RE'S-NEHAŞ:

Ji rojnama fransîz (Le Jûr-Le Jour) ya Ko li Bérûtê dertêt. (8 Hizérân 1943)

Di çiyayêne Betrûnê de mîrine xurt hebûn. Li gora gotina wan ji kurdên eyûbf dadiketin. Lê piştre ewçend qels ketîne ko têkîlî xelkê bûnê û ketîne xizaniyê. Îro hin ji wan cot-kariyê dikin; hinê din daran dibirin; hin ji parsê dikin. Digel vê hindê guhdarê necabeta xwe ne û pê iftixar dikin. Keçen xwe nadin mirovén adetî, bi xwe ji keçen xelkê nayşnîn.

Gava parsê dikin jî bi tenê ji mîr û şexan dixwazin.

Heke yekî bê pirsa « Mîr » silav li wan kir an banî wan kir, lê venagerfinin. Îro di gundekî Betrûnê de dijin. Ji ber ko navê wan ê kevin hatiye ji bîr kirin navê gundê wan li wan dikin û dibêjine wan mîrén Re's-Nehaş.

INTIQAMA MEYMÜNAH:

Wek her dehbê, meymûn jî heke cih lê teng ne bû dirêjî mirovan nakin. Lê gava dirêjî wan dikin zererine mezin digehfinin wan. Bi rastî di nav meymûnan de cisînîne wele hene ko bi zexmî û xurtiya bedena xwe gelekf serdestî me ne. Lê ew jî bişa sebeb bela xwe nadin însanen.

Di Efriqayê de memûrén mistemlikan gelek caran dîtime ko kerfîne meymûnan dirêjî gun-dekî kirine û gund xistine xerabiyê. Lakîn hercar tehqîqatê daye zanîn ko súc yê gun-diyân bûye.


Vê paşiyê di mistemlekeke ingilîzi, Pera-vân-zêr de meymûnên şempanze avêtîne ser gundekî û ew xerab kirine. Li gora rapora memûrê ko çûye tehqîqatê mesele bi awayê jérin çebûye.

Berf du salan di wf gundi de jinikêkê cêwî anî bûn. Li gora adetîn reşikên wf welaif cêwî tiştekî çift e. Ji lewre rabûn yek ji Peresto re qurban kiri bûn. Kurê reşik û kurê şempanze di nav çend rojan de bû bûn dosten hev û bi hev re, wek biran dijin.

Piştî midekî bavê cêwîyan di rîlê de şempanzekî nûza girti bû û ew bîr bû nik kurê xwe, li şuna kurê ko ji Peresto re qurban kiri bûn. Kurê reşik û kurê şempanze di nav çend rojan de bû bûn dosten hev û bi hev re, wek biran dijin.

Rojekê, gundikî tîrek berda sînga şempanze û ew kuşt. Ji wê rojê ve şempanzeyêne rîlê neyartî bi gundiyan re ajotin. Lê ne hate zanîn şempanzeyêne rîlê çawan bi kuştina şempanzeyê gund hesiyan.

Dawiyê şempanze li gund wer hatin û ew di bin mihaserê de hiştin. Bi awakî ko kesf ne dikarî ji gund derkeve. Şevekê dirêjî gund kirin, ketin xaniyan, tiştîn ko diketin desten



DILONDRE DE XWARINXANEKE HERWE

QERTEL Ú KÜSİ

Rojekê qertelek geleki birçî maye, dike êdf bimire. Di ber kevirekî de sekinî. Ji birçîna stûyê wî ber de ketiye.

Küsiyek di wir re derbas dibe û wî dibîne. Jê re dibêje: Birayê qertel ci li te bûye ko tu wer stuxwar li ber vî kevirî sekiniyî?

Qertel lê vedigirîne: Xwênga küsi, li halê min nepirse, çend roj in birçî me, dikim bimirim.

Küsi dibêje: Tistek heye, ez ji te re bibêjim; lê ditirsîn tu bêbeytiyan li min bikî.

Qertel: Bêbextiyan li te nakim, bibêje ci ye?

Küsi: Xwarinék hey; tim jî peyda dibe. Tu ji min re sond bixwî, niha raberi te bikim.

Qertel jê re sond xwar. Küsi got ê: Di vî erdî de küsi pir in. Hema wan bigire, bêxe nav pencen xwe, bi hewa bikeve, bilind be û paşê wan berde ser keviran. Ewê qalikê wan bişkê, hundirê wan tijî gost e; hema ji xwe re bixwe.

Wextê wê wer got këfa qertel hat; perê xwe dawêsand û got: Xwênga küsi, tu dibîni halê min nîne ez bigerim; ma ji te çetir heye?..

Qertel küsi xiste nav pencen xwe û bi hewa ket. Küsiye dorê gava wilo ditin ji wî erdi baz dan.

Hema: 12 7 1943

MIHYEDÎN PEHLEWÎ



Ş ESKERİ EMËRİKANİ İ PIYADE Ş
SSSS DIGEL ÇEKEN XWE SSSS
SSSSSS SSSSSSSSSSSSSSSSSSSSSSSSSSS

wan şkînandin, xerab kirin. Lê ji peyan, ji gundiye ko sempanze kuşti bû pêve dest ne dane tûkesî lê ew kustin û cendekê wî kirin çenî.

Jİ KËVROŞKE BEZATIR:

Yeki denîmarkî bi navê Frod Jakobson di bêzê de, beza bi lingan, gelek xurt bû. Beriya serî di misabeqeyên navmilesin de yekemin derketi bû. Vê pasiyê Jakobson bi hevalên xwe re şert kir; da pey këvroskekê û ew bi destan girt.

Heke Jakobson hat wetalê me ewê bê şik qedirê tajiy n me ên delal kêm bike.

BALAFIRËN BARKÊŞ:

Emêrike ji hevalbendên xwe re çek û posatan ne bi tenê di riya behirê re û bi vaporan lê di riya ezman re û bi balafiran jî disine. Berî hertişî riya ezmanan kurtir e û jê pêve amintir e; taluka noqavan tê de nîne

Ji bona vê yekê emêrîkaniyan balafirine xweser çêkirine. Ji van balafiran re balafirén barkêş dibêjin. Ev balafir ji berê de û li nik her dewletê hebûn. Lê emêrîkaniyan tipê van balafiran gelek bi ser xistine û mixdara wan zêde kirine.

Ev balafirên ha digehin her qada şer. Ji Emêrîkê rast bi rast diçin Ewîstralye, Nû-Zê-

land, Elaska û giravên Pesifikkê. Di riya Eys-landê re digehin Ingîlistanê. Di riyên Emêrika nviro, Efrîqê û di Misirê re digehin welatê Ûris, Çinê û giravên l'Esifikkê ên nviro.

Li wan balafiran ji top û tifing û cebir-xanan pêve her texlit çekên mîkanîkî jî bar dikin, Di mehcetê de esker jî lê siwar dibin.

Balafirén barkêş riya sed saeti di saetekê de dibin, Yanf riya ko vapor di behirê de di sed saeti de dibin vê riye bi xwe ev balafir di ezmanan de di saetekê de dibin.

Ev balafir hero bêtir, bileztir dibin û tî-pine wê ên nû û mezintir çedîkin,

XURTIYA PORAN:

Ji berê de nas e ko pirç û pora mirov gelek xurt û zexim e. Di şerîn berê de ji pora jinan werîsin çedîkirin û ew werîs di hilanîna minciniqan de istîmal dikirin. Di şerîn Roma û Qertacyayê de jinê qertaci porêن xwe ên delal diqusandin û didan ordiwê.

Lê vê paşiyê rabûn û xurtiya poran, wek her tişti mîzan kirine. Jê xuya kir ko avdak mü giraniya 178 graman dikare hilfne. Bi texmîn li serî jinikekê 30 000 avda mü hene. Li gora vî hisabi tevayıya pora jinikekê dikare giraniya 5 000 kîloyî hilfne.

XEBERGUHÊZ

HINEK JI HENEK

XANIM Ü XADIM:

Xanim (ji xadima xwe re) Ez naxwazim ko destgirtiyê te hero bê û li ber deriyê me biskeine

Xadim — Belê xanim ez ji pê hesiyam û ji lewre şevêdi min ew bire oda xwe.

LAWIK / ŞAŞ E:

Yek diçe û di kazînokê de rûdine. Lawikê xizmetkar tê û jê dipirse:

— Mîrza ci emir dike.

Mîrik: Kasek şerab.

Lawik diçe û ji mişterî re kasek şerab tîne û wê datîne ser masê. Dema dike vegere mişterî banî wî dike û dibêjê:

— Heke te li şûna şerabê kasek bire ji min re anî xem heye?

Lawik: Tu xem nîne...

Lawik şerabê dibe û li şûne kasek bire tîne. Mîrik bîra xwe vedixwe û bêî ko heqê wê bide, dide rê û diçê.

Lawik dide pey û dibêjê:

— Mirza te heqê bîrayê ne da...

Mîrik: Belê min ne da, ji ber ko te ew ji min re li şûna şerabê anî

Lawik: Te heqê şerabê ji ne da..

Mîrik: Ma min şerab vexwariye ko ez heqê wê bidim.

Lawik (hineki dide eqile xwe û dibêjê) Belê xebera te ye; lê şerab bi 75 qırûşan, bire bi pêncî qırûşî ye.

Mîrik: Hingî min ji te 25 qırûş divêtin.


Lawik. (dîsa dide eqile xwe û dibêjê) Belê ev ji rast e.

Lawik cizdanê xwe derdixine û ji mîrik re 25 qırûşan ji dide.

KURDMANCINO

Kurdmancino hon kom bibin
Da xelk bêjin bizane kurd
De'wa heqê xwe hon bikin
Da kes nebêt bêzar e kurd
De'wê biken bi qanûnê
Méran bik'jin birêjin xûnê
Mîrin çetir ji vê jinê
Sed aferîn mîranê kurd
Kurdêm çiya heke der bin
Weki şeran weko ber bin
Peşya yekî sed çepêr bin
Bo şer weki sindane kurd
Kurdêm mezin gelek caran
Wan bêzaran, wan bekaran
Kore dibin j'bo dinaran
Bû dil b'her kovane kurd
Zengin e kurd, wek mîr biket
Belengazan ew têr biket
Cergê feqîr wek sér biket
Ew car e, wek sultan e kurd
Gelf Botan û Hekarî
Digel soran û Zêbarî
Îş ken roj û şevêt tarî
Ev bo me ye hemiyan e'kurd
Kurd bendar dest serdestî
L'pêş...suxir şikesti
Mîrin bo xwe îş Xudê xwestî
Şefil bi sergirdan e kurd
Heqê xwe bin bi topizî
Hon têr biken şolet xîzî
Zango çîma tu eciz î
Nê bêser û bê xwedan e kurd.

MÎRZANGO BELBEŞİNİ
XEBATDARË WELAT



Kelkê Ewropayê, herweki em berxan bi xwedi û dermale dîkin, ew ji kntikên berazan di hewş û bexçeyêñ malen xwe de bi xweyi dîkin. Di wextê bombaranen Londrê de digel mirovan gelek heywan ji hatine kuştin. Lê çiroka vî berazê londrayî yê ko ji ber eskerên agirkuj dike bireve xerib e. Di wextê bombaranan de eskerên agirkuj û peyayêñ fedayı dicün û mirovén ko di bin kevirên xaniyên hilweşiyayî de diman xelas dikirin. Rojekê eskerine agirkuj dema ko kevir û stûnên xanîk hilweşiyayî radikirin dengeki xeniqî kirin û xwe li cihê ko deng jê dihat lezandin. Digotin qey dengê peyayekî ye. Lê gava kevir rakirin ci bibinin, berazekî fêris û tu-tişt-pênehatî ye li wî sekîn ye. Eskeran beraz ji nav keviran derêxist; bi guhêñ wî girtin û ber bi qışlê ajotin.

XARKOV

Di meha Tebaxê de sondxwari bi du zeferên mezin şa bûne. Sefera Siciliyê xelas bû û girav bi temamî ket destêñ qewetên ingilizî û emêrikanî û li 23ê Tebaxê elemanan da zanîn ko Lajarê Xarkovê tala kirine. Di pey elemanan re ürisan elam da û got ko cskerên Sovyêtistanê bi hictûmeke cebri Xarkov vegirtina. Sovyêtistanê ev zefer şâhinet

kir û Stalin bi emîrnamekê pesnê eskerên xwe da.

Bi vegirtina Xarkovê ürisan careke din şant xurtiya xwe da. Bi Misin û Xarkovê keleha Ewropayê careke din hejîha.

Bi vegirtina Xarkovê ürisan di eniya rohelê de serdestike mezin xistiye destêñ xwe. Xarkov raşeri rasta Ukranyayê ye. Yê ko Xarkov di destêñ wi de ye dikare neyarê xwe bişenê û bi rahetî direjî wi bike.

Ev cara didowan e ko üris Xarkovê distiñin. Di sala 1941ê da elemanan ew pişti şerîne xwinîdar zemt kiri bû. Eleman qedere şanzdeh mehan té de man. Di Sibata sala 1942an de ürisan Xarkov bi sun de vegerand û elemen jê derêxistin. Lé elemnan ji ber ehemîyeta Xarkovê zuka xwe kar kir û pişti şend rojan avêtin ser bajêr û üris jê derêxistin. Vê carê elemen 23 heftan di Xarkovê de man û li 23ê Tebaxê jê kîsiyan. Ji ber ko üris lê wer dihatin û dikirin bajêr mi-hasere bikin.

Xarkov ji ehemîyata xwe a eskeri pêve merkezeke sinahiye. Piraniya tangên Sovyêtistanê di fabrikayêni Xarkovê de dihatin çekirin. Berîya seri di fabrikayêni Xarkovê de 900000 emele dixebeitin. Ji tangan pê 've li Xarkovê balusir ji çedikirin. Üris bi vegirtina Xarkovê ne mane. Di 'erîsa xwe de pê didin erdê û şhero pêş ve diçin. Gelo 'elemen careke din 'wê biceribinin Xarkovê bistimîn?

Herwekt me berê ji goti bû di şerî rohela de roj bi roj elemen kêm üris zêde. dikin.



KEPORAL MORIS DÜ FRETAY — LE CAPORAL MAURICE DU FRETAY

Keporal bi mana onbasi ye. Keporal Moris balafrîvan bû. Pişti ko Fransa şikest û elemanan ew vegirt Moris ji kete destêñ dijimin. Moris dixwest xwe bigehîne De Gol; lê rê pê ne diket. Moris di yek wexti de anekînist bû. Rabû ji xwe re balafrîrek çekir, lê siwar bû û xwe ginandine Ingilterê. Ilikümela gradî ew bi nişaneke mezin mikafat kir. Hevalen Moris ew rakirine ser milen xwe.

ELEMANYE Ú ROHELAT

L'ALLEMAGNE ET L'EST

Par le Colonel V. Hurban, ambassadeur de Tchcoslovaquie aux Etats-Unis

Çekoslovakie ji dewletén Ewropa navin e. Erdé vê dewleté beriya seré 1914-1918an wilayetine Nemse ù Elmanayé bûn. Pişti wi seré Çekoslovakie wek Polonyayé bû dawleteke biserxwe. Hitler pişti konferansa Münixe desté xwe diréji Çekoslovakayé kir. Çekoslovakie xudan ordú bû û gava talûke nizing bû karê xwe kir ko dest bibe xwe. Lé piştre, gavafordiwén elemanı di tixûbén vê de hésidin dest hilnani û elemanan ew welat bê teq û req vegirt û ew kirin du wilayatén xwe. Lé pişti ko ser dest pê kir, Çekoslovakian ji di Londré de hikümeket saz kir û ji çekoslovakâner derveyî welêt esker dane hey, ew di welatén rohelaté nizing de talim kirin û di seré Efrîqayé de pardariya cidalé kirin.

Kulnél V. Hürban di Wessingtonde sefiré Çekoslovakayayé ye. Ve paşiyé Hürban di klûbeke jinan de gotarek daye. Kulnél di destpêké de gotiye « Tiştén ko eze bibejim ne bi tené fikira min; lé ew di yek wextî de fikira hikûmeta min in ji ». Ji vi awirf ve gotara kulnél biehemiyete.

Kulnél di gotara xwe de qala vi serî, nizama Ewropa a nû, di vê nizamé de rewşa welaté xwe û cezakirina elemanan kiriye.

Ji gotara kulnél emê nemaze tiştén ko di

heqê welaté xwe, dewletén Ewropa navin û Ewropa nivro-rohelé de gotine ber peyi xwendevanén xwe bikin.

Kulnél dibéje: Çekoslovakian çavén xwe nemaze berdaye Ewropa navin û Ewropa nivro-rohelé. Di van erdan de ji sed milyoni bêtir rûniştiman dijn û lê qewm û miletine gelér hene. Ev miletén han du dewletén mezin ji hev dikin; yanî dikevin navbera wan: Rûsyé û Elmanye.

Elmanye divêt cézayé xwe bibîne û ev dewlet hetanî ko cézayé xwe bikişine di sazkirina nizama Ewropa navin de nikare bibe xudan ray û gotin.

Li gora fikirên ko heta niho hatine eşkere kirin ji bo dewletén Ewropayé ên piçük hevkârîke héj himbizir tête pêşnihad kirin. Jé re şikiline têvel « mixtelîf » dibinîn; mifsalan ditfinin. Wek dewletén emêrikanî ên yekbûyî, lé her dewlet di karén xwe ên hundirin de biserxwetir. An tifaqeke eskeri. An bi tené hevkârîke peran û gurmikan. Hin dibéjin ko hemî dewletén ewropayî ên piçük ji Baltiq heta Behira spî divêt di yek tifaqê de bigehin hev. Hin dibéjin divêt sê tof bêne saz kirin: dewletén bakur-roava, dewletén çemê Tûnê, dewletén Balqanê. Hlinen din ji du tofan pêşnihad dikin: dewletén bakur, dewletén nivro.

Lé mesele bi hêmanine din héj zehmetir dibe.

İro Çekoslovakie, Polonye, Yûgoslavie û Yewnanistan hevalbendén sondxwariyan in. Hercî Mecaristan, Romanya, Bixaristan, najerên mihwirene. Nemse di bin nfrê elemanan, Welaté ernewitan di bin hikimê talyanan de ye. Tirkîye héj bêteref e.

Ev hêmanen ha şanf me didin ko helkirina van meseilan cıqas dişwar e. Digel vê hindê divêt her milet ji xiwe re helekê peyda bike û ntzin-giyê li miletteki bike.

Me ev tişt bi Polonyayê ceriband. Ji xwe ev tiştteki gelek tebfi ye. Büyerén salén 1938-1939angansane ko di navbera van her du miletan de ye qediriyek (yek-qederiyek) heye. Pişti sala 1920an di vê riyê de ev her du milet qederekî pêş ev çû bûn. Lé siyaseta kulnél



Di vi serî de herweki eteman ji úrisan têşin japon ji ji ber çiniyan di zehmeteke giran de ne. Çini diçin welatine bîyani û hini fenine nû dibin. Klîşa me balafîrvanine çinî şanî dide. Ev balafîrvan di Emîrikê de hini sinhetâ xwe bûne.

Bek, wezirxarioiyé Polonyé ev
xebat pûç'kir.


Di sala 1940f de ji nû ve herdu dewlet ketin mizakeré û bi hev re beyanameyek belav kirin. Di wê beyanamêde digotin: « Polonye û Çekoslovakye ji ber iştiraka menfehetâ xwe ji niho de didin zanîn ko ji van her du dewletan re pişti xelasbuna şerf hevkarkhe gelek himbiz divétin. Dîsan ev her du dewleten ha, xwe amade didin zanîn da ko pişti şerf û wek dewletine biserxwe bikenin civateke siyasî û fîqisadî ya ko di Ewropayé de wê bête danîn û ya ko dê bibe himê nîzama Ewropa navîn ». Lé ji hingê ve mişkilatine nû şerf dane.[1]

Sefirê çekoslovak bi gotina xwe a paşin işaret li gelşa ko ketiye navbera ûris û poloniyan, dike.

Seffir gotina xwe pêş ve tajo û dibéje: İro awaye dîtina çekoslovakian bi awaye jérin dikare bête xulase kirin. Çekoslovakye hergav xwazekaré hevkariya Polonyayé ye. Çekoslovakye tucaran nikare bikeve tifaqake ko ew di elêhê Rûsyayé de hatiye saz kirin. Tu şik té de nîne ko tifiqake çek û poloniyan divêt bi raya dewleten Ewropayé ên mezin, yên rohelê û roavê, bête danîn.

Yanî Çekoslovakye dixwaze bi dewleten Ewropa navîn re, hevkariyé bike. Ev hevkari bêf Sovyétistan û raya dewleten roavê nikare

[1] Mexseda sefir ji wan mişkilatian minasebetên rûs û poloni ne. Ji ber, kuyşuna zabitine poloni hikûmeta poloni ya ko li Londrê rûdine qutbiruya xwe ji ûrisan kiri bû.



TOPEKE JAPONÎ E EÉRIS YA KO DI GIRAVÊN
SILÉMAN DE KEIYE DESTÎEN EMÉRİKANIYAN

here şerf. Jî pêve ji bo Çekoslovak'yayê tu çare nîne.

Tîstê ko ez dibéjim ne bi tenê ji çekoslovakian re, lê ji hemî dewleten Ewropayé ên piçük re divêt bête têtbîq kirin. Mesela dewleten Ewropayé ên piçük ancax bi lihevhatineke xwerû ewropayî dikare bête saff kirin. Ev ji gava rohelat rasif roavê têtu pê re gotina xwe yek dike diçe sérî.

Ev dewleten ha jî bi tenê bi hevkari û lihevhatineke rastin dikarin rahet û di aşiyê de bijin. Ji bona vê yeke ji, ji wan dewletan re divêt ji istiqalêl xwe fedakarîna bikin. Çekoslovakye ji bona ko bikare xwe bigehîne wê armanca bilind ji wê fedakariyê re amade ye ».

HEJMARA HAWARÉ A 57AN LI 15È TEBAXË BELAV BÜYE. LÈ BIGERIN Û TÊ DE BIXWİNIN;

Tefsîra Quranê. Şeytanqûni. Diwana Melê. Gulistan. Memozina Xani. Ya Reb. Sefera Sicillyayê
Hêviya Nuh. Ez û Yar. Çeteyên Rûsî. Feryad. Panama.

Kiriyariya Ronahiyê

Ji bo Sûriyê Pênc lireyên sùri — Ji bo welatén din lîrekt ingiltî

Xwedi û gerinendeyê berpirsiyar : Mir Celadet Alf Bedir-Xan. Şam—Sûriye
Directeur Propriétaire: Emir Djéladet Aali Bedir-Khan. Damas—Syrie